

Seîd Newresî binasin

Amedekar: Hesên Cûmî

S. Newresî di sala 1878 an de, li Nûrisê, navça Betlîsê ji dayîk dibe. Xwendina xwe ya pêşîn, li dibistana Mehmûd Celalî kuta dike. Ji ber zîrek, tîgihîştin û jîrbûna wî navê " Bedî-Elzeman lê tê kirin. Di sala 1894 an, di pirtûkxana Betlîsê de, du salan xwendina xwe berdewam dike. Piştê diçe Wanê û deh sala li wir bi cî û war dibe û kar û xebata xwe ya olî berdewam dike. Rojekê li qonaqa walî, di rojnameyekê de, nûçeyê weha dibîne " *daku em kanibin Misilmanan hukim bikin , divê em wan ji Quranê sar bikin*". Gava wê nûçeyê dibîne, S. N weha dibêje " *Ezê ji hemî gelên cîhanê re nîşan bidim Ku, Quran ronahiyeke ji Xwedê ve ye û tu carî nayê vemrandin*".

Ji bo vê yekê berê xwe dide paytexta Osmanî Stenbolê, li xana Şekirciyan bi cî û war dibe û tabloyekê bi deriyê xwe dixê, li ser weha dinivîse: " *Ji hemî pirsan re , bersiv heye , lê ji tu kesî pirs nayên kirin*". Olhez û kesên dixwazin ola Îslamî nas bikin, berê xwe didin wî .Di demeke kurt de, dibe navekî navdar û dengê wî li nav xelkê belav dibe.

Hêvî û merema S.N ew bû, ku li Wanê zanîngeheke Îslamî bi navê – zanîngeha Zehra-avabike. Ji bo vê daxwazê, berê xwe dide padîşahê Osmanî. Lê mixabin , padîşahê Osmanî guh nade wî. Di sala 1910 an de, vediger Wanê, li hemî bajarên Kurdistanê digere, bi serokeşîrên Kurdan re, li ser bûyerên demê dipeyive. Di sala 1911 an de, berê xwe dide Şamê, di mizgefta Emewî de, li ser rewşa siyasî, aborî û civakî ya civaka Îslamî dipeyive. Ew (xutbe) li Şamê çap dibe û bi navê (xutba Şamê) tê belavkirin. Piştê vedigere Stenbolê, pêwendiyê bi Kurdên stenbolê re dike , daku, wan şiyar bike. S.N di gotareke xwe de, li ser nexweşî û çareseriyê nexweşiyên Kurdan weha dibêje: " *Lihevkin, Quwet, heyat û birayetî se, dete. Sê*

cewhrên me hene, 1- Îslameti. 2- Însaneti. 3- Miletê me ye. Û sê dujminên me hene 1- Feqîrtî. 2- nezani .3- cudatî (Ixtîlaf) .

Di şerê cêhanê yê yekem de, ji bo parastina welêt, bi şagirtên xwe ve, dikeve nav şer, pir şagirtên wî di şer de dimirin û ew jî ji hêla Rûsan ve tê girtin. Bi alîkariya hêzên Alman vedigere Stenbolê. Gava Ingilîz dikeve Stenbolê, S.N, Fetwekê li dijî dagîkeriya Ingilîz diweşîne. Di dema serhildana Anadolî de, S.N fetwe da ku her kesê li dijî dagîkeran şer bike, ew (mucahîde). Piştî serkeftina Kemalîzmê, ew bi şêwekî fermî di meclîsa Anqerê de hate pêşwazîkirin.

Di serhidana Şêx Seîdê kal de, tê girtin ? penaberî Sparta dikin. Li wir piraniya berhemên xwe û ya herî bi nav û deng " *Nameyên Nûr*" dinivîse û diweşîne. Li wir jî bi 120 şagirtan ve tê girtin û wan dibin girtîgeha Eskîşehirê. Di dû re , pir caran tê girtin û penaberkirin , û sê caran serdestên dewletê hewil didin, ku wî bi jehrê bikujin. Cara dawî, li Stenbolê, ji ber pirtûka xwe ya bi navê " *Rêbera Ciwanan*" bi sê heyvan tê cezakirin.

Seîdê Kurd , di dawiya jiyana xwe de, diçe Ruhayê, li wir pir nexweş dibe. Daku, li Kurdistanê neyê veşartin, destlat fermana penaberiyê distine, ku wî careke din vegehin Sparta. Di 23 î Avdara 1960î, li Ruhayê diçe ser dilovaniya xwedê. Lê mixabin, nijadperestiya dewletê û bi alîkariya Genêral Alpaslan Türkêş, laşê wî tê dizîn û ta nuha jî kes nizane gorna wî li kû ye?.